

228_Tietoa eristyspäätöksen saanelle_1
[kurdi(kurmanji)]

Agahdarî ji bo vergirê biryara tecrîdê

Ji ber erêbûna tûşîbûna we ji COVID-19 ji we re destûr tê dayin ku hûn werin tecrîd kirin. Armanca vê tecrîdê ew e ku pêşî ji belavbûna vîrusa korona ji kesên din re bigirin. Biryara tecrîdê li gorî Zagana Nexweşiya Tûşîbûnê hate girtin.

Agahdariyên têkildarî maweya tecrîda we tê di gel pêşniyarê de radestî we bibe. Maweya tecrîdê bi giştî 7 roj ji destpêkirina nîşanan ji bo kesek bi nîşanan sivik û 14 roj ji bo kesên ku pêwîstî bi nivistina li nexweşxaneyê heye, pêk tê. Tecrîd dikare piştî du rojan bêy hebûna nîşanan bidawî bibe. Eger tûşîbûna we bi nimûneyê were erê kirin û hûn ti nîşanan tecrûbe nekin, maweya tecrîdê 7 roj ji roja nimûneyê ye.

Tecrîd tê çi wateyê?

Tecrîd ew deme ku dibe hûn di xaniyê xwe de derbas bikin. Pêdivî ye ku hûn ji têkiliya nêzîk bi kesên din dûr bin û li malê de bimînin. Ji bo nimûne, nabe ku hûn biçin cihê kar, dibistan, baxçeyê zarokan, şahî, firoşgeh an dermanxane yê, ji ber ku li van deran dûrketina ji têkiliyek nêzîk bi kesên din dijwar e. Nabe kes serdana we bike û divê hûn xwarina xwe sifariş bidin.

Eger kesek nikaribe xwarin an derman ji we re radest bike, hûn dikarin ji jimareya 09 310 44400 re telefon bikin.

Ji bo kêmkirina rîska tûşîbûnê, divê hûn ji kesên din ên ku li malê de dijîn, dûr bibin. Eger gengaz be, divê hûn li odeyek cûda de bimînin. Paqijiya guncan a destan û kuxikê girîng e.

Herwisa dema ku hûn bi kûçikê xwe re digerin an çopê derdixin divê hûn ji têkiliya bi kesên din re dûr bin.

Demanê nexweşiyê

Eger nîşanên we sivik bin û hûn nava komek bi xetere de nebin, dibe ku hûn nexweşiya xwe li malê derman bikin. Bijîşkê tedawîker an bijîşkê navenda tenduristiya we dema ku we ji encama nimûneya vîrusa korona agadar dike, dê rewşa we binirxîne. Di dema nexweşiyê de bêtend an û vexwarina şilemeniyên guncan girîng e. Hûn dikarin bi dermanên bêy nivîsa bijîşkî ta û êşa xwe aram bikin.

Eger nîşanên giran ên mîna bêtengiya nefesê tecrûbe dikin û rewşa weya giştî xerabtir bibe, bi jimareya 09 09101024 bi binkeya tenduristiyê an xizmetên şewirmendiya vîrusa Corona ya li bajêr bigerin (her roj ji saet 8–18 vekirî ye). Di rewşên din de, bi hejmara 116 117 bi şîreta bijîşkî re têkiliyê bikin. Di rewşên ku pêdivî bi dermankirina bilez heye, ji bo nimûne eger hûn ji nişka êşa singî tecrûbe bikin, bi jimareya 112 ya acîl re têkiliyê bikin.

228_Tietoa eristyspäätöksen saanelle_1
[kurdi(kurmanji)]

Eger zaroka/ê we tûşî vîrusa korona bibe, ev belavok jî tê ji we re bête şandin. Eger zaroka/ê yek ji nîşanên jêrîn tecrûbe bike, ji kerema xwe bilez serdana bijîşkek bikin - bêyî berçav girtina sedemên nexweşiyê yan rewşa bingehîn.

- Pirsgirêkên nefesê
- Çermê reşûşîn
- Zarok têr navexwû
- Verêşîna giran an domdar
- Zarok ji xewê şiyar nabe û bertek nîşanî tiştekan nade
- Pitik ew qas nearam e ku nikare di nav lepên we de aram be
- Nîşan t êk diçin, tenê bi taya girantir û kuxikê vedigerin

Qerebûya jidestdayina dahatê

Mafê we heye ku ji ber jidestdayina dahata ji ber tecrîdê alîkariya xercê nexweşiya tûşîbûnê bistînin. Hûn dikarin ji bo standina vê serdana saziya Sîgorteya Civakî (Kela) bikin. Hûn biryarek tecrîdê ku ji aliyê Bijîşkê Nexweşiya tûşîbûnê yê Helsinki ve hatiye nivîsandin, ku divê bi daxwaza we re were girêdan, bistînin. Biryara tecrîdê dê jixweber wekî nameyek qeydkirî yan e-mailek ewle ji were tê bête şandin. Divê hûn daxwaza xwe di nav du mehan ji roja derçûna tecrîdê bidin Kela yê.

Alîkariya nexweşiyên giştgir tê bi tevahî qerebûya jidestdayina dahatê ji ber neçûna ser şolê, tecrîdê, an karantîneyê bike. Alîkariya xercê rojane ya karmendan li gorî meaşê ku di kar îde distendin tê diyar kirin. Alîkariya xercê rojane ya karsazên bi dahata salane di bin bernameyên sîgorteya teqawida kesên serbixwe de (YEL) û cotkaran (MYEL) di destpêka necûna ser karî de tête diyar kirin. Sergêrên zarokek ku temenê wî/wê di bin 16 saliyê de ye, eger zarok were tecrîd kirin û sergêr nikaribe bixebite, tê alîkariya xercê nexweşiya tûşîbûnê hebe. Agahiyên zêdetir li vir berdestin <https://www.kela.fi/web/en/sickness-allowances-infectious-disease>.

Derbarê karantîneyê tê bi t êkilîyên we y ên n êzîk re t êkilî p êk were.

Xebata Epidemiolojîk ya Helsinkî t ê t êkiliya n êzîka we û dema karantîniya ji bo wan re plan bike. Karantîne t ê ji t êkiliya dawîn bi kesê tûşîbûyî re bo maweya 10 rojan bidome. Eger kesek zêdetir di heman malê de ku hûn t ê da ne, dimînine, maweya karantîneyê ji destpêkirina nîşanên yekim kesê tûşîbûyî yan ji roja girtina nimûneyê ji kesê bêy nîşan, du hefte ne.

Divê tecrîd were p êk anîn

Divê tecrîd ku ji aliyê karbidestên nexweşiya tûşîbûnê ve hatî dayîn bi tevahî bête şopandin. Li gorî tecrîd Fîndaliyayê, binpêkirina biryara karantîneyê dikare wek tawana di jî parastina tenduristiyê bi cezayê aborî yan heya sê mehan zindan were cezakirin, her çend hûn kesek din jî nexweş nekin.